



Ev proje ji alîyê Yetîya Ewrûpa'yê ve tê finance kirin.

# KEDXWARIYA BAZIRGANIYA ZAROKAN SÛC E!



TURİZMA  
HEVALÊ  
ZAROKA



INTERNATIONAL  
CHILDREN'S CENTER

Bazirganiya zarokan, binpêkirina mafekî zarokan yê herî giran e. Tê vê wateyê ku ji aliyê hinek kes yan jî hinek koman ve bi pereyan an jî bi teşeyek din transverkirina zarokekî ye.

**Li gorî daneyên UNISEF'Ê;  
di cîhanê her sal de kêr zêde  
mîlyonek zarok ber bi fihûşê  
ve tê kaşkirin.**

Piraniya zarokan ji ew kesên ku wan ji aliyê cinsî ve bikartînin ditirsin ku wê xerabiyê li wan û malbatên wan bikin. Ji ber vê yekê jî nizanin ku wê serî li kîjan meqamên fermî bidin. Zarokên wisa xwe bêçare hîsdikin.

**Hûn dikarin bibin dengê wan.**

**LI MAFÊ ZAROKAN  
XWEDÎ DERKEVIN!**



# Ê KU VÎ SÛCÎ DIKIN KÎ NE Û RÊ Û RÊBAZÊN WAN ÇI NE?

Ew kesên ku wê, zarokên we yan jî zarokên li derdora we kedxwariyê dikin hinek rê û rêbazên cûda cûda bikartînin. Di nav wan rêbazên de gef xwarin, zordestî û xapandin jî he ye. Carnan jî ji bêçare mayînên wan zarokan bikartînin. Dibe ku di nav wan kesên kedxwariyê dikin de xizmên zarokan yan jî nasên zarokan û kesên derdorê wan jî hene. Her wiha dibe ku ew kes baziganiya mirovan dikin an jî dibe ku komeke sûcdar be jî. Ew kesên sûcdar kîjan rê û rêbazan bikartînin?

- Hinek rê û rêbazên ew kesên ku kedxwariya zarokan ya cinsî dikin wiha ye;
- Malbatên ku rewşa wan ya aborî ne baş re dibêjin ku emê zarokên li we baş binerin û wê zarokên we tu tengasiyê nekşînin. Hêwirîn(xwedîkirin), pere, dîyariyên biha yan jî dayîna soza karekî
- Soza peyda kirina nasname û pelikê gerê.
- Soza derfetên derketina sînor ya derveyê welêt. Ji wan weke bi keştiyê an jî botên behre.
- Bi rêya zewicandina di temenê biçûk/pirzewac/hewitî jî di kedxwariya zarokan ya cinsî de tîkî bikaranîn. Ev rêyan weke ku çandî didin qebûlkin.

## KEDXWARIYA ZAROKAN YA CINSÎ BINPÊKIRINEKE MAFÊ ZAROKAN E, Û SÛC E!

Kedxwariya zarokan ya cinsî; tê vê wateyê ku carna nakît yan jî weke malekî bazirganî jî bo berjewendiyên hinekan tîkî bikaranîn. Mixabin zarok jî aliyê cinsî ve tîkî bikaranîn. Ev cûreyê kedxwariyê carna bi teşeyên cûr bi cûr derdikeve hemberî me.

- Kedxwariya cinsî
- Bikaranîna zarokan ya di pornografîyê de
- Kedxwariya zarokan ya cinsî li ser telefon û înternetan
- Armancên bikaranîna kedxwariya cinsî ya beşa rêwîti û turîzmê
- Bi armanca bazirganî ve bikaranîna zarokan.
- Zewicandina bi zorê an jî bi dek û dolaban
- Zewacên di temenê biçûk de (li Tirkîyê temenê zewacê 18 e)
- Pirzewac û hewitî (ev mekanîzmeyeke ne hemwelatiye û ne qanûnî ye jî. Nayê qebûlkin)



ÎSTÎSMARA CINSÎ Û KEDXWARIYA CINSÎ, PÊŞVEÇÛYÎNA ZAROKAN YA PSÎKO-CIVAKÎ TÊKDIBE.

## TECRUBEYEKE JÎYANÊ YA TRAWMATÎK E

- Mexdûr hîsên tirs, bêçare û fêdikirinê dijîn.
- Dibe ku ji bo pêşerojê xemên wan hebin.
- Ji bo qanûnan nizanin, nizanin ku wê ji ku alîkariyê bixwazin.
- Ditirsin ku ew kesên ku vî sûcî dikin wê xerabiyê bidin malbat û hezkiriyên wan.
- Dibe ku ji bo munasebeta cinsî tîn zorkirin. Bi rêya cinsî hinek nexweşî hildigrin û dibe ku dûcaniyên ku naxwazin jî çêdibin.
- Dibe bi zorê di cîhên ku ne li gorî wan de werin xebitandin.
- Dibe ku pêşveçûna hîsî, fizîkî û dişkan bandoreke neyînî bibîne.
- Ji ber sedemên şertên dijwar û bêçare, wê demê dibe ku çareseriyê tenê zewicandina zarokan xûya dîke. Lewra ev rewş wê gelek xerabiyê bide pêşveçûna hîsî û fizîkî. Her wiha ev rewş dibe ku pirsgirêkên tendûristî jî bi xwe re bîne.
- Ji xwe li welatê me jî li gorî peymanekê di 7 Îlonê di sala 1956 da saziyên xûlamtiyê, bazirganiya xûlamiyê û sepanên weke wan hate rakirin. Dîsa li gorî wê peymanê jî zarokên ku di temen biçûk de tîn zewicandin weke sepaneke xûlamtiyê hate qebûl kirin.

## JI BÎR NEKIN!

Li Tirkîyê mehra ku li gorî qanûnan tîn qebûl kirin mehra fermî ye. Li Qanûna Medenî ya Tirk zewicandinên zarokan û pirzewac sûc e. Kirdariya cezayî heye. Mehrên olî ya weke ku ne fermî nayên qebûl kirin û ne dadî ye jî.

## Komên di bin rîskê de:

Li jêr mînakên dibe ku zarokên di bin rîskê de hatiye nivîsandin. Rewşên ku di vê lîstê de cî girtiye, ji bo zarokên cûda dibe ku rîskên cûda be. Ev rewşê rîsk dibe ku ji ê jêr zêdetirbin jî.

- Zarokên di dema kamil bûyînê de
- Zarokên Mexdûrên şer
- Zarokên ku ji mafê perwerdehiyê kêmanî
- Zarokên bê xwedî (zarokên ku ji malbata xwe cûda mayî)
- Zarokên ku rewşa wan yê aborîyê ne baş
- Zarokên dixebitin/ji bo ku dixebitin tîn zorkirin/zarokên ku di kolanan de bi zorê parsektiyê dikin
- Di dema gîhanê zarokên ku ji aliyê fizîkî û mejî ve cûda
- Zarokên ku bûn mexdûrê sûcan û ê ku sûcdar hatin kirin.
- Di malekê de jîyandina ji kesekî zêdetir

# Rewşên bi gûman ku zarokên di bin rîskê de

- Zarok bi zarokên ji temenê xwe mezintir re hevaltî dikin.
- Piştî dibistanê an jî piştî kar neçûna malê.
- Hevalên ku her tim tîna gûherîn.
- Bi wesayîten biha yan jî bi wesayîten cûda cûda ji malê rahêştin.
- Qezencên madî ya ku nikarin werin gotin yan jî diyariyên biha.
- Zarokên ku bi malbatên xwe re têkilîyê qût dikin.
- Belavbûna mejî
- Gûherînen devgeriyên zarokan.
- Di bikaranîna medyaya civakî û telefonan de gûhertineke balkêş
- Daxwaziya gelek caran li malên hevalan de
- Daxwaza xwe pir paqijkirinê û xwe şuştinê.
- Xûyaniyên fizîkî (weke lêdanê)
- Di mijara cinsî de axaftinên û tevgeriyên ne li gorî temenê wan
- Asayî dîtina tevgeriyên cinsî.
- Di zarokên seqet de zêdebûna qeyrana hêrsbûnê

Di van rewşan de divê malbat zarokên xwe netirsînin û wan sûcdar nekin.

## Agahiyên Ragihandinê û Mekanîzmayên Serlêdanê: **BÊ DENG NEMÎNIN!**

Dema ku we rewşeke bi gûman dît, hûn dikarin li ev beşên dadî bigerin.

- **155**- Polîs hawar
- **156**- Cendirme (cîhên ku derveyî bajar, navçe û cîhên ku polîs lînin.)
- **183**- Xeta Alîkariya civakî
- **112**- Xizmetên Tendûristî ya Lezgîn
- **157**- Navenda Ragihandina Biyanî (YÎMER)

YÎMER bi Tirkî, Ingilîzî, 'Erebî, Rûsî, Almanî û Farisî 7 rojan û 24 seatan xizmet dide. Ev sazî alîkariya kesên biyanî û jî aliyê destûra îqamêya navnetewî, parastina demî de alîkariyê dide. Di mijara bazirganiya mirovan de xelaskirina mexdûrên mirovan de jî gelekî alîkariyê dide.

444 48 68- UNHCR-SGDD ( Komeleya Piştigiriya Koçberan û Penaberan) Xeta Şêwirmendiyê

Li Tirkîyê ji bo penaberan û koçberan bi zimanê 'Erebî, Ingilîzî, Farisî û Tirkî xizmet dide. Rojên Duşem û Pêncşemê ji seat 09:00 heta 17:00'an, roja îne jî ji seat 09:00 heta 16:00'an xizmet dide.

168- Xeta Alîkariya Lezgîn Hêvvasor Ya Tirk

Bi Zimanê Tirkî, 'Erebî, Ingilîzî, Farisî û Peştû xizmet dide.



## Xemên we ji aliyê pêvajoya dadî û danezanan heye?

### *Ez xwe tenê hîsdikim. Kî dikarê alîkariya min bike?*

- Hûn dikarin Xeta Piştgiriya Civakî ya Wezareta Xizmetên Civakî û Xebata Malbat bigerin (Alo 183)
- Hûn dikarin bigihîjin Xeta Alîkariya Lezgîn Hêvvasor ya Tirk. (Alo 168) hûn dikarin ji Navenda Civakî Hêvvasor alîkariyê bixwazin. Ev xet bi Tirkî, Erebî, Ingîlîzî, Farisî û Peştî xizmet dide. Ji vê xetê piştgiriya zimanî piştgiriya psîko-civakî, piştgiriya dadî, piştgiriya parêzerî tê dayîn.
- Komeleya Piştevanîya Koçberan û Penaberan (SGDD) Rêxistina Penaber Neteweyên Yekbûyî (UNHCR) (444 48 68) an jî (Komeleya Piştgiriya Penaberan) (+903124272702)
- UNFPA Xeta Piştgiriya Penaberan (08508880539) intersex xeta ji bo nexweşiyên bî rêya cinsî û bî rêya ferdî tê mirovan piştgiriya psikolojîk û tibî tê dayîn. Ev xizmet 7 rojan û 24 seatan tî dayîn.

### *Lê herkes hîn bibe!*

Di pêvajoya dadî û di hemû saziyên serlêdan de parastina nepenitîyê heye.

### *Ez Tirkî nizanim!*

Di pêvajoya dadî de hûn dikarin ji saziyên ewlehî û dozgeriyê alîkariya wergerandina belaş bixwazin. Herwiha li bajarên ku lê dijîn rêxistinên ku bi penaberan re dixebitin. (SGDD Weqfa Pêşvebirina Çavkanîyên Mirovan Danîsh Refugee Council hwd) piştgiriya didin. YÎMER (157) hûn dikarin bi vir re têkevin tîkiliyê û alîkariya ziman bistînin.

### *Parêzerê min nîne!*

Piştî ku we serî li dadê da, di çarçoveya alîkariya dadî de weke mecbûrî parêzer tê dayîn. (Li Gorî Qanûna Muhakemeya Ceza) heke parêzer nedin we mefê we yê ku hûn reda bikin heye. Herwiha di pêvajoya dadî an jî beriya wê hûn dikarin bi baroyên parêzeran re jî têkevin tîkiliyê. Di Yekîtiya Baroyên Tirkîyê di pirsgrêkên zarokan de gelekî hişmendin.

### *Perê min/ derfetên min aborî nîne!*

Di pêvajoya dadî de xizmetên piştgiriya parêzer û wergêr belaş in. Hûn dikarin ji Rêveberiya Navend Xizmetên Civakî û Xebatê ya Malbat, ji Rêveberiya Navçeyê, Şaredariyên Navend û Navçeyan jî alîkariyê bixwazin.

**\*Li Tirkîyê qanûnên ji bo zarokan, ji bo parastina hemû zarokan e.**



Ev weşan bi piştgirîya finansî ya Yekîtiya Ewrûpa'yê ve hatiye çêkirin.  
Naveroka weşanê tenê di berpîrsîyarîya Navenda Zarok ya Navnetewî de  
ye. Û ev weşan ne nêrînên Yekîtiya Ewrûpayê

